

PIRS

Kovareke Rewşenbîrî û Serbixwe ye

Pêşgotin:

Li pêşiyê ... Gazin!! 2

Gotar:

Çima fêrkirin û parastina zimanê Kurdî li paş maye?..Dilvanê Deştê..4

Leyla Qasimê Hesên Mistefa Henan 9

Lêkolîn:

Navên şênwaran li navça Efrînê Rozad Elî 14

Wêje:

Helbestvana Almanî Sara kirc... Tengezarê Marînî 20

- Helbest

Rewşa Perwînan Merwan Berekat 25

Tenê tu Xweda yî Bahoz Duderî 27

- Pexşan:

Arat Mûrûvet Y.Cacim 29

Sirûda stranên a Siltan Silêman Salh Bozan 30

Civak:

Bûyera Reş M.Qere Hesên 35

Ensest Mizgîn Bşngol 39

Kelpûr:

Sehên Zozanên Qedrîcan 41

Ji kelepûra gelêrî M.Henan 43

Weşanên nû 45

Birûskek..... 46

Navên zarokan 47

Posta xwendevanan 48

www.kovarapirs@yahoo.com Buha 50 L.S

Li pêşiyê... Gazin!!

Berê çend salan, dora 10 kovaran bi zimanê Kurdî li Sûryayê dihatin weşandin, hin jê ji hêla partiyan, hin jî ji hêla kesan ve dihatin derhanîn. Erê ew kovar bi dizî û bê destûra dewletê çap dibûn û belav dibûn, hinek jî belkî salê carekê û di rewşên teng de bi derdiketin, lê digel wê, mera pê hestwar dibû, ku livek û tevgereke rewşenbîrî heye, yê dixawzin binivîsin hene, û kesên ku dixwastin bixwînin jî hebûn. Lê mixabin, ew kovar mîna pelên payîzê yek li dû yekê ji dara çanda Kurdî weşîn, û niha tenê yek yan didû jê mane, ew jî mîna hêva bin ewran, xulekekê derdikevin û bi katan jî winda dibin.

Erê şert û mercên çapkirin û belavkirinê li Sûryayê dijwar in, ew yek berê jî hebû, lê me kanî bi kanî xwe yê taybet bi wan rewşan re bidaûbistanda û çavên xwe bi dîtina kovarên xwe kil bida. Lê belê li roja îro pirs û pirsgirêka me ne tenê ew asteng in, em kanin bêjin hîç ne ew e jî, li roja îro pirs pirsan û serê heft sedeman sedemek e, ew jî kêmbûna xwendevana ye, li van çend salên dawîn rewşa xwendinê bûye wekî ku xwendevanan û pirtûkan bav û birayên hev kuştine, û dijmantiyêke kûr di navbera wan de peyda bûye.

Bêguman hinek dê bêjin ((ê kesên ku dizanin bi Kurdî bixwînin kê in, û nivîsarên hêja jî tinene!!)). Belkî jî ev gotina ku dilê mera pir dêşîne pir rast be, lê belê ew her du tişt li ba mirovê ku bi hezkirina zimanê xwe ve girêdayî be û li ber dikeve hîç nabin bihane, ew bihaneyên mirovên qels in.

Em Kurd hîn negihîştine rewşa fantaziyayê di xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe ku bêjin ev nivîsara bi zimanê Kurdî baş e û hêjayî xwendinê ye û ev na! çiqas xirab û şerme ku xortek ji zanîngê derdiçe û hîn tîpên zimanê xwe nas nake û nizane pê bixwîne û binivîse!!

Gereke em baş têbighên ku em di rewşa hebûn û tinebûna tevahiya zimanê Kurdî de ne, riya rêvebjartin li pêş me pir teng e û ji bilî şivîleke pir teng û zirav tineye, ew jî gereke, na belê ustubariyek e mezin e li ser milê me hemiyan, ku em bil û can li zimanê xwe xudî derkevin û wî mîna tiştê xwe yê herî biha bibînin û biparêzin.

Tiştê ku bêtir dilê mera dêşîne, ew e ku rewşa qelsbûna xwendevaniyê ne li ba me tenê heye, ew li beşên Kurdistanê yên din jî heye, nemaze li bakurê Kurdistanê.

Berî vê me nivîsareke nivîskar Mirad Gundikî di malpera Nefelê de xwend, tê de wiha goti bû:

((Berê min digot erê kurd gelekî naxwînin lê ya kêma "nivîskar ji nivîskaran re dinivîsin" û li vir û li wir hinek xwendevan jî hene dixwînin.

Berî niha ez bi nivîskarekî navdar re axivîm, wî pirtûkeke çîrokan a gelek û gelek xweş nivîsî bû. Ji min re got "li Diyarbekirê ji bo daxuyaniyekê 149 nivîskaran îmze kirine, lê çawa dibe ko bi heyîna evqas nivîskar jî, tenê 50 pirtûkên min hatine firotin". Min bi halekî matmayî lê nêrî. Ji ber ko min yek ji wê pirtûkê ji xwe re û dido jî ji hezkiriyên xwe re kiribûn. Çi problema me heye ko Kurd Kurdî naxwînin an jî belkî qet naxwînin? Ez nizanîm...)).

Ezê bêjim problem di me de ye, li ba me ye, lê mixabin piraniya xwendevan, rewşenbîr û siyasetvanên me jî herdem pirsgerêkê û çareserîya wê dixin ustûyê rewşan, û herwiha li dawiyê jî rewşa zimanê me ji qedera bêbext re dimîne !?.

Gotar:

Çima Fêrkirin û parastina zimanê KURDÎ li paş maye?

Li destpêkê, dixwazim destnîşan bikim, ku şevbiwêrkeke giranbuha bi amadekirina Komîta Çalakîyên Kurdewariyê li Qamişlo hatibû li darxistin, navnîşana wê ev bû: “Çima Xwendevanên Zimanê Kurdî Kêm in”.

Hejmareke baş ji nivîskar û rewşenbîrên Kurd lê beşdar bûn, wan nerînên pir hêja û pêwîst derxistin holê, û dest li ser piraniya kêmasî, asteng û aloziyan danîn. Lê mixabin ew şevbiwêrk, bi tevaya xwe, bi tariya wê şevê re winda bû, û çî sûde jê ne hat wergirtin. Lewma jî ez ketim gumanan!! Ma gelo tenê naskirin û danasîna nexweşiyê dê merovê nexweş saxlem bike? yan dermankirina wê nexweşiyê tê xwastin?

Dr. Nûredîn Zaza li derbarê vê pirsê wiha dibêje: **"Eger tu bixwazî xwe bi xelkê bidî naskirin, zimanê xwe bixwîne û bide xwendin. Û eger win**

Dilovanê Deştê

bixwazin ji hev tar û mar nebin, dîsa zimanê xwe bixwînin û bidine xwendin."

Bîkon (Bîgon), ronakbîrê Firansî yê navdar jî, wiha gotiye: **"Eger tu bixwazî mîletekî bindest bikî, pêdivîye tu nehêlî fêrî zimanê xwe bibe, û ne jî bi kar bîne."**

Ew du nerînên zanistî ji sedsala 20an e, her du jî didin xûyakirin ku bandora zimên li hebûn û jiyana netewan, bandoreke bingehîn û sereke ye.

Li gorî nerînên ku zimanzanên berî çerxa 20an dane nasîn, ziman yek e ji alavên têkilî û danûstandinê di navbera mîlet û netwan de. Lê belê ji destpêka sedsaliya 20an û bi şûn de, nerînên zimanzanan hin bi hin hatine gûhertin, û lêkolînine zimanyarî yen fireh li ser rola zimanan di parastin û pêşveçûna netewan de hatine holê.

Ziman yek e ji encamên herî pêwîst ên ramanyariyê, her wekû zimanzanê bi nav û deng Çomiskî, dibêjê "...ziman şêweyên ramanyariyê ji mirov re ronî dikê ". Di bîr û baweriyên Çomiskî de hebûna zimanekî xurt û bi hêz, û bikaranîna wî bi berfirehî, çandêke azad û serbixwe ava dike. Çandêke wisa zengîn û xweser jî neteweyekî hevgerî û pêşketî ava dike û diparêze. Lê ji aliyê din ve jî, windakirina zimên bindestkirina netewe ye, çunkî ziman mercê heyînê yê pêşî ye.

Yek ji zimanên herî kevin di dîroka rojhilata navîn de zimanê Kurdî ye, lê digel ku ew nenivîskî bû jî, wî xwe parast, wînda ne bû û bi demê re xwe nû jî dikir, ev jî ango nivîsandin, bû sedema ku çî gavên fireh ber bi pêş ve nehatin avêtin.

Piştî ku zimanê me yê makder bû zimanekî nivîskî, rewşenbîrên kurd dest bi xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe yê şêrîn kirin, lê - sed mixabin - di heman demê de, alozî pir bûn û di pêşiya rastxwendin û rastnivîsandina bi Kurdî de bûn kelem. Daku

em karibin van aloziyan xîş bikin, tê xwestin em astengan nas bikin û dest li ser wan dînin. Em dikarin astengên di pêşiya fêrkirina zimên de, di du beşan de bi nav bikin: Beşê bilêvkirinî, û beşê nivîskî.

1- Beşê devkî: Bilêvkirina bêjeyên biyanî di danûstandinê de, aloziyeke mezin e. Di salên pêşî de ji temenê xwe, dema zarok gotinên biyanî ji dê, bav, xwişk, bira, heval û hogirên xwe dibihîzin, ew jî wan wekû bihîstine tînin ser zimên, û herwiha ew gotin di mejiyê wan de têne çesipandin. Ev pirsgerêk roleke pir mezin di windabûna zimên de dileyîze, eger hêdî hêdî be jî, lê pir bi hikarî ye.

Ji bo çareserkirina vê pirsgerêkê, tê xwestin ku di hundirê malbatê de baş guhdarî li zimanê dê bibe, û gotinên biyanî bi lêv nebin, yan jî pir kêmbin. Siyasetmedar di civatan de, endamên rêxistinên siyasî, nemaze endamên rêvebir jî, di civatên xwe yê rêxistinî de di ber pareke mezin de ji vê ustûbariyê berpirsiyar in. Çî hindik û çî gelek, ew delameta rewşenbîr û nivîskara

ya grîngtir e, lê mixabin ew ne bikar tînin, ne jî li ser wê pirsgirêkê radiwestin. Ew di nivîsandina gotaran de xwe ji gotinên biyanî pir diparêzin, lê di axaftinê de, nêzî 35-40% ji gotinên wan ne kurdî ne.

Ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê pêwîst e her kesekî kurd zimanê xwe ji zîwan û quncirê paqij bike. wek nimûne, nebêjin (teb'en, wext, ictîma'î, tenfîz, museqef, ...) lê belê li şûna wan bêjin (jixwe, dem, civakî, bikaranîn, rewşenbîr, ...).

Rola dengbêjî û dengbêjan jî ji rolên nofa jorîn ne kêmtir in. Wekû her kes dizane, dengê sazan (mûzîk) rê dajo dilan, bi giyan re dipeyive, û vehisîneke xuya û diyar ji mejî re peyda dike, lewma jî çi gotinên bi awaz û ne awaz, bi dengê sazan re têne gotin, bileztir û zûtir xwe bi mejî ve girêdidin. Li gor vê lezgîniya ezberkirina gotinên bi riya awazê, dîsa ziyana li zimên dibe mezin e.

Di baweriya min de pir girîng e, ku malên me bibin dibîstanên zimanê kurdî, û endamên rêxistin û grûpên

çandeyî û rewşenbîrî bibin mamoste. Wisa jî wê parastina zimên û çanda me hêsantir bibe.

2- Beşê duwemîn, beşê nivîskî: Eger hebûna çandêke xweser bi fêrkirin û parastina zimên ve grêdayî ye, berdewamiya netewekî serbixwe û xwegirtî jî li ser wê çanda xwerû û zengîn ava dibe. Niha jî pirsêke sereke xwe bi xurtî tîne ser zimên: Ma gelo kar û xebata me di ber zimanê me yê makder de gihaye radeya ku çandêke wisa xwerû ava bike ? Da ku em karibin bersiva vê pirsê bidin, pêdiviya ku em êş û azarên xwe yên di warê rastxwendin, rastnivîsandin û rêzimanî de baş nas bikin û çareser bikin.

Neveşartî ye ku rijîm li Sûryê qet rê nade tu netewên din ji bilî netewa Erebî ku mafên xwe yên netewî bikar bînin, ew ziman, çand û hebûna miletê Kurd bi tevahî jî nabîne û qedexe dike, û çi tiştêkî ku bi miletê Kurd û dîroka wî ve, yan jî bi zimanê Kurdî ve girêdayî be qedexe dike. Weke nimûne li ser vê yekê, em dibînin ku ew navên kurdî yên gund, bajar

û herêmên Kurdî diguhêre û yên Erebî li şûnê bi kar tîne.

Li dema niha TV ji alavên ragihandinê yên pir pêwîst e û roleke pir mezin di warê zimên de dileyîze, lê mixabin em wek milletê Kurd li Sûryê kenaleke me nîne, û di demên nêzîk û berçav de jî çî projeyên wisa xuya nabin.

Rewşa aborî jî yek ji astengên mezin e, ji ber ku kesek belengaz, hejar, xizan û perîşan be, wê kari be bi rê, şivîl û awayên fêrbûna zimên mijûl bibe ?

Lê ji ber ku îro roj ew rewşên dijwar serdest in û em nikarin van aloziyan çareser bikin, lê em dikarin xwe ji vê girav û çirava ku me bi destên xwe, xwe tê de noq kiriye, derxin.

Wekû em dizanin, fêrbûn û xwefêrkirina zimên ji Alfabejê de dest pê dike, û bi xwendina pirtûkan jî xurt dibe. Lê her wekû em dizanin Elfabeyên Kurdî hindik belav dibin, ew jî yên kevn in û çapkirina wan dubare dibe. Ji bilî çend **DÎWANÊN** helbestvanan, pirtûkên bi zimanê Kurdî jî pir

kêm in, ta radeya nêzîkî tunebûnê, ewên hene jî sergêjahiyekê ji xwendevanan re çê dikin, çunkî di naveroka wan de pir şaşîtî derbas dibin, nexasim di warê rastnivîs û rêzimanê de. Wek nimûne, hin ji wan di yek gotinê de tîpina dûbare dikin, hin jî dijî vê yekê ne. Nêrkirin û mêkirina navdêran jî pirsgrêkeke din e pir mezin e, her nivîskarek li gorî zarava xwe, navdêran nêrza yan jî mêza dike.

Rewşenbîr û nivîskar tişteki din e neyinî bikartînin, ew di gotar û nivîsarên xwe de daxwaza paqijkirin û parastina zimên dikin, lê sed mixabin, di jiyana xwe ya rojane de ti karî di ber de nakin, ango ew **pirbêjin lê kêmkar in.**

Ji alîkî din ve jî, em dikarin pir şaşîtiyan di warê rastnivîsê de di nivîsar û gotarên wan de bibînin, mînak li ser vê jî, hin nivîskar dibêjin: " pir gerektir e ", ev bixwe jî tişteki pir şaş e, ya dirist ew e ku em bêjin " gerektir e " ji ber ku paşpirtik (parkîta) " -tir " bixwe wateya pirtirbûnê dest nîşan dikê.

Ji nav alavên ragihandinê, entirnet alava herî girîng e, ji ber ku roj bi roj nû dibe, lê rûpelên wê bûne panav (meydan) ji şer û pevçûnê re. Ez dikarim bêjim ku malperên entirnetê ne alîkarê fêrkirin û parastina zimanê kurdî ne; Tenê ew bûne yarîgeh ji lîstokên xame û pêûsên zikreşan re.

Belavok û weşanên bi kurdî dertên jî, çi karên baş û xuya di ber fêrkirin û parastina zimên de nakin. Û her wekû ev belavok û weşan bi partiyên tevgera kurdî ve girêdayî ne, wilo jî tevger bi tevaya xwe di ber van kêmasiyan de berpirsiyar e.

Nivîsarên li ser rêziman û rastnivîsandina bi zimanê kurdî, eger hebin jî pir kêmtir in. Digel vê jî ew kesên ku di rêzimana kurdî de mijûl dibin, ew rêzimanên biyanî li ser zimanê xwe yê kurdî bikar tînin, yan jî rêzimana kurdî didin ber yê biyanî, daku durustî û nedurustiya bendekê ji bendên rêzimana xwe bidin xuyakirin. Lê belê em dikarin di vî derî de bipirsin: Ma gelo durust û rewşa ye ku em rêzimanên biyanî,

Engilîzî, Firansî, Tirkî li ser zimanê Kurdî, yan jî çi zimanekî din be, bikar bînin? Eger ev tişt rast û durust be, ji bo çi her zimanek li gor rêzik û rêzimanê serbixwe tê pîvan û nirxandin? Her wiha pêwîst e ku rawestandineke baş li ser vê xalê bi cih bibe.

Di bîr û baweriyên min de, eger rewş bi vî rengî berdewam bibe, wê zîyanên pir mezin û giran bigihên çanda me. Mezintirîn pîrsa ku xwe tîne holê ev e: Gelo emê çawa van astengan rakin daku zimanê me yê makder pêşkeve?

Bersiva vê pîrsê bi her kurdekî neteweparêz ve girêdayî ye. Di her malbatekê de, dê, bav, xwîşk û bira hemû di ber bersivdana vê pîrsê de berpirsiyar in. Ustûbariya wan e ku hîn zimanê xwe bibin û di hundurê malbatê de jî bidin xwendin. Ustûbariya endamên rêxistinên siyasî, nemaze yê rêvebir jî ji ya malbatê ne kêmtir e, çunkî ew dikarin biryaran ji bo birêvebirin û bikaranîna xwendin û nivîsandina bi zimanê dê bidin.

Cile - 2009

Leyla Qasimê Hesên

Leyla Qasimê Hesên nimûneyek e ji keça kurd, navê wê di nav gel û civaka kurdî de nasraw û navdar bûye, ew yekemîn keç bû li Îraqê ku hat bidarxistin. Ew keça hêja, keça welatparêz û şoreşvan, ji ber welatê xwe, ji bo bicihanîna xewinên xwe, ji bo serxwabûn û azadiya welatê xwe, tiştê herî buha, giyanê xwe ji azadî û serxwabûna Kurdistanê re pêşkêş kir. Eevîna welêt û azadiyê li ba wê di ser her tiştî re bû.

Leyla bi xebata xwe ya pîroz, diyar kir ku maf û erkên jina Kurd ne kêmtirî mafê mêrê Kurd e, ji ber vê yekê navê wê bi tîpin zêrîn di dîroka gelê Kurd de hat nivîsandin. Lehenga me pakrewana nazdar Leylê xwast vê gotinê bi cîh bîne (şêr şêr e çî jin e çî mêr e), ji ber wê jî dema ku bû endamek ji Partiya Demokrat a Kurdistanê, wê di nav rêxistina mêran de kar kir, wê bi

cudakirina di nav mêr û jinan de bawer ne dikir, digot: Jin jî weke mêran e, divê ew jî



cihê xwe yê rast di nava civakê de bistîne û bi karê xwe rabe, û herwiha Leylê ligel destgirtiyê xwe Cewad Hemewendî xebata xwe ya siyasî di nav mêran de dikir, û bi hev re jî hatin girtin û bi darxistin, û bûn qurbana Kurd û Kurdistanê.

Jînenîgariya Leylê:

Leyla keça Qêsim Kurê Hesên e, li (27/12/ 1952 an li gundê Banmilê ku bi ser bajarê Xaneqînê ve ye, di nav malbateke hejar û welatperwer de ji dayîk bûye û çavê xwe vekiriye. Bavê leylê di kargeha parzandina petrolê (Misfat El neft) de kar dikir, û digel ku bavê wê xizan û hejar bû, lê ev

rewşa ne bûbû sedemek ku ew zarokên xwe nexe dibistanê û wan bi xwandin nede, hêviya wî ew bû ku zarokên xwe (Leyla, Sebîhe, Selam, Sefa û Selah) bi xwendin bide, û ne dixwast rewşa ku ew tê de dijîn bandora xwe li ser zarokên wî bike, zarokên wî jî armanca bavê xwe bi cîh anîn,tev di xwandina xwe de zîrek û pêşeng bûn û pileyên bilind di xwandina xwe de distandin û di ber xwandina xwe re alîkariya bavê xwe jî dikirin.

Leyle li sala 1958an derbas dibistanê dibe, xwandina sereta û ya navendî û bekeloriya li xwendegehên Xaneqînê bi dawî dike, pişt re berê xwe dide Bexdadê û li zanîngeha Bexdadê di kulîja wêjeyê beşê civaknasiyê de xwandina xwe dike û heya sinfê sisiyan dixwîne.

Ew li Bexdadê di riya hevalê xwe yê xwandinê Cewad Hemewendî re Yekîtiya Qutabiyên Kurdistanê dinase û dibe endameke zîrek di Yekîtiyê de, li wê demê Leyla û Cewêd bi her ve dibin destgirtî û xebata xwe ya

siyasî jî ligel hev berdewam dikin. Leylê bi xebata xwe dubat fikir ku gereke jin û keçên Kurd jî ligel mêrê Kurd têkoşîn û xebatê ji ber doza gelê xwe bikin û lê xwedî derkevin. Ji ber çalakiyên Leylê û destgirtiyê wê, rijîma Beis li Îraqê ew kiribûn bin çavdêriyê û çalakiyên wan dipan.

Li roja yekşemê (28/4/1974an) piştî nivê şevê, parastinên rijîmê dor mala Leylê digrin, dema ku Leyle bi wan agahdar dibe, hemî pelgeyên xwe, navên heval û her tiştên ku bi Partî ve girêdayî bûn dişewitîne.

Berî leyle were girtin, ciwantrîn cilên xwe li xwe dike û bi dayîka xwe re dibêje: Dayê, xemgîn nebe, cilên reş li xwe meke û reşiyê girêmede, min xwe kiriye qurbana kurdistanê, û ezê bibim bûka kurdistanê. Di wê şevê de, Leyle û çar hevalên wê: Hesen Heme Reşît, Nerîman Fuad, Azad Slêman Mîran û destgirtiyê wê Cewad Hemewendî jî tîr girtin, peyayên dewletê wê çavgirtî û destgirêdayî dibin û dixin

zindanê. Di zindanê de hemî şêweyên îşkencekirinê bi wan re bi kar tînin, heya çavê wê yê rastê jî kûr dikin, lê ew dîsa nikanin ti aghî û zanînan ji wan bibin, di wir de zebaniyek ji wê re dibêje: Çi li ba te bihatir e? cavên te, lê Kurdistan?! Wê bi serbilindî got: Kurdistan ji giyan û çavên min bihatir e, û herwiha ew bi hovîtî çavê wê dirjîne.

Dema ku celadan nikanin ti zanin ji wan bibrana, dewletê ew terorîst bi nav kirin û gunehbar kirin, û radyoyê wê digot: Wan çayxane û sînema teqandine.

Rijîma Be'is, ji bo êşandin û tirsandina ciwan û xwandekarên Kurd, dadgehek taybet ji bo wan li darxist û Leylê û hevalên wê di demeke kurt de û bi lez dane dadgehê û sizeya bidarvekirinê ji wan re da. Lê wan serê xwe ji dijmin û dadkeran re tu carî danedixistin, Leylê bi Dengekî bilind bi dadmendê re got: (Min bikujin, lê bila win vê rastiye bizanibin, bi kuştina min dê bi hezaran Kurd ji xewa giran şiyar bibin, ez pir kêfxweş im ku bi serfirazî û di

riya azadiya Kurdistanê de canê xwe fîda dikim.

Karbidestên rijîma Be'is xweş dizanin ku keçeke zane, jîr û dilêr mîna Leylê dê bandoreke mezin li xwandevanên Kurd û Erebian jî bike, loma jî wê di demeke pir kin de fermana sêdarekirina wê û hevalên wê bi derxistin, û li roja yekşemê (12-5- 1974an) li katjimêr 7ên sibê qehremana kurdan û her çar hevalên wê hatin bidarxistin.

Ew roj bû rojeke xemgîn li nav civaka kurd, şehîdbûna Leylê û hevalên wê, hestê netewî û şoreşgerî di giyana keç û xortên kurdan de nemaze yê xwandevan bilind kirin, û bi hezaran berê xwe dan çiyayên Kurdistanê û tev şoreşa gelê Kurd bûn.

Li roja şehîdbûna Leylê, bi hezaran dayîkên kurd navê Leylê li keçên xwe kirin, û ew bû pêşenga jinên şoreşger û sembola jinên Kurd li dijî zordariyê.

Berî ku leylê bi darxînin jê xwastin nameyek poşmaniye û lêborîne ji Serok komarê re bişîne, lê wê bi baweriyeke kûr

li wan vegerand û got: (Eger ez di jiyane de ji tişteki poşmam bibim, ew e ku ez zû dimrim û bêyî bikaribim demeke dirêj ji bo gelê xwe xebatê bikim, çinkî min ji bo doza gelê xwe ve hindik xebat kiriye).

Berî ku Leyle were bidarxistin, rê dan xudiyên wê ku serdana wê bikin, wê hingê wê ji dê û bavê xwe xwast ku cilên wê yên kurdî jê re wînin da li xwe bike, û dema berê wê dan ber sêdarê, wê bê tris û bi dengê bilind, bang kir û got: Bijî Kurdistan, bijî gelê Kurd, bijî Barzanî, û sirûda netewa kurd Ey Reqî xwand.

Leyle li derbarê zilm û zora ku jina kurd tê de bû wiha digot: Divê guhartinek civakî, aborî û rêzanî di civaka gelê Kurd de were kirin, eger gelê Kurd mafê xwe yê netewî û çarenûsî nestîne, mafên jina Kurd jî bi cih netên.

Hîn ji zaroktiya wê de hesta netewî û evîna welêt di dilê Leylê de serî hildida, wê jî dixwast welatê xwe wek hemî welatên cihanê azad û rizgar bibîne, zilm û zora dagîrkeran

dilê wê disotand, ew ji ber vê yekê ketibû nava xebata gelê xwe.

Leyle di riya birayê xwe yê mezin Selam re di sala 1970î de derbas nav rêzên P.D.K dibû, armanca wê ew bû, ji hemî kesan re xûya bike ku jina Kurd di xebat û çalakiyan de ne kêmtirî mêra ye. Û wilo wê ligel hevalên xwe, xebat û çalakiyên rêxistinî li nav bajaran, nemaze li Bexdadê berfireh kirin.

Şehîdbûna Leyla hestê afrandinê di giyanê helbestvanên kurd de germ kir, li derbarê şehîdbûna wê, gelek helbest li ser qehremaniya wê hatin ristin û gotar hatin nivisandin, tê de pesna canfîdayî û lehengiya wê dan, wek: Hêmin Mukiriyani, Şêrko Bêkes, Tîrêj, Cegerxwîn...

Cegerxwîn di helbesteke xwe de li ser şehîdbûna Leylê wiha dibêje:

Leyla keça Mît û Meda
Canê xwe da di ber me da
Bijîn heçî ku canfîda
Xweş bin ji te jar û geda
Leyla çiraxa şevreş e
Wê rû li Kurdan kir geş e

Kuştin bi me Kurdan xweş
e
Zordarî îdî nameş e
Leyla bijî sed aferîn
Ji bo me bûye ol û dîn
Li min derbûne birîn
Heya cigerê min bûye
xwîn

Di helbesteke din de jî wiha
dibêje:

Şêr şêr e mêr e yan jin e
Nîşan bi dest Leyla min e
Pola ye dil wek hesin e
Leyla kî ye?
Leyla jin e
Leyla min e
Leyla min e Leyla welêt
Wê dil li min kir ar û pêt
Mizgîn li kurd roja me têt
Dijmin ji tirsan maye şêt

Gelek nivîskarên Erebi jî li
ser Leylê nivîsandin. Ji wan
nivîskarê Îraqî Ebdilîlah El-
Sayêg, wî di gotareke xwe ye bi
navnîşana (Leyla Qasem Feyli
şehîda Kurdistanê ya nemir) de
wiha diêje: ((Keç û kurên cihanê,
Leyla Qêsim jî mîna hevîdarên
xweşiyê bû, ji stran û semayê hez
dikir, ew jî wek we diçû
zanîngê, pirtûkên xwe di

çenteyekî çermî de hildigirtin,
Leylê mîna we evîna dil jî zanî.
Ey gêncên cihanê, ji ewên
dibêjin ku Sedam Husên Mîrê
Muimina ye, ji wan re bêjin: Ey
Muiminê ta radeya le'nekirinê,
çima te qutabiya zanîngê
Leyla Qêsim bi dar de kir, te
çima dilyarê wê Cewadê
Hemawendî kuşt, ey muiminê ta
radeya verşandinê qirêj, tu çi
mîrî ey Sedam, çi muimanan ku
tu kirine mîrê xwe:

Govdê te yê di kufikê de çûye
Gora neyara te Leyle
mehrecanek bînxweşî, dilgeşî û
serbilindî ye

Ez gelekî bêkêf im wekî ku
min careke tenê jî tu ne dîtî

Min ji destên te yên biçûk,
hema danek jî nexwar û
venexwar

Leyla Qasim
Ez mizgînê dighînim te
Xwîna te li arê neçû
Ala azadiyê li ser xaka
Kurdistanê hat hildan)).

Belê... Mizgîn ji te re Leyleya
nemir, kulîlkên Newrozê li ser
gora te şîn dibin, û li seranserî
welêt gênc ji te re rêz digrin.

Mistefa Hehan.. 12/5/2009

Lêkolîn:

Navên şênewaran li navça Efrînê

Rozad Elî

Li derbarê navên şênewaran li Sûryayê di serdemên têvel de, bi taybetî jî li bakurê wê, lêkolînavan Ebdela El-Îlû wiha dibêje: Navên berî serdema nijada Samî li bakurê Sûryayê ji deverên wê yê din bêtir in, lê ew nav li gor gelên ku lê rûniştine û destlatên destlatdarî lê kirine, ji hev cida dibin /pirtûka El-Usûl El-Suryeniye..., Ebdela El-Îlû, rûp 36/. Ango guman heye ku li gor rûniştvan û destlatan, navê cihekî çendçarkî hati be guhertin. Ji ber ku, her hinekan ew nav bi şeweyekî fermî diguhertin, û li zimanê ku li wê hîngê bi kar dihat tanîn, carna jî ji ber egerên siyasî ew dihatin guhertin.

Lê belê yê ku li destpêkê ferman da, da ku hemî nav li Sûryayê werin guhertin û bibin Erebî, Xelîfeyê Umewî Ebdilmelêk bû (685-705)Z, / Ebdela El-Îlû, rûpel 4/.

Piraniya pir ji navên warên şên li Na.Efrînê ji kok û wateyên xwe de Kurdî ne. Hin jê navên rûniştvanên gund ên destpêkê ne, hin navên hozên Kurdî ne, hin jî navên cihên ku gund lê hatine avakirin û ji salixên wan yê Xaknîgarî ne... û hwd. Hejmareke hindik jî, Tirkî, Erebî yan jî ji binyatên Aramî-Siryanî-Yûnanî ne, hejmareke biçûk jî me nikanî kok û wateya wan nas bikira.

Bi tevahî, navên gundan li Na.Efrînê parve sê nofan dibin:

- Gelêrî ku xelk bikar tîne.
- Fermî ji serdema Osmanî de.
- Fermî di parkirinên kargêrî yê Komara Sûryayê de.

I. Binavkirinên Gelêrî:

Ew nav bi şeweyên xwe yên resen û kevin ji aliyê millet ve tîn xebtandin. Bi tevahî, em kanin binyata zimanî ya nofeke mezin ji wan navan wiha rave bikin:

1. Navên bi tîpa “a” bi dawî dibin: Ew piraniya navan e. Tîpa “a” tîpa yekê ye ji nîşandeka “an” a çivandina/tewardina navan di zimanê Kurdî de. Lê di bilêvkirina gelêrî de, tîpa “n” jê hatiye xistin û tîpa “a” bi tena xwe li dawîya navan ma ye. Wek mînak: Gu.Zerkan bûye Zerka, Gu.Xilalkan bûya Xilalka... û hwd.

2. Navên bi parkîta “-nd” û “-if” kuta dibin: Wek navên gund, Turind, Tilif...û hwd. Kîtên “-if û -nd” jî du parkîtin ji zimanê Hitîtî ne ji kevin de mane, ew ji bo nav û dîmenên Xaknîgarî bi kar dihatin.

3. Navên bi pêrkîta “Ba” dest pê dibin: Hejmara wan heft in. Ji bo wate û delameta pêrkîta ’ba’ jî du nêrîn hene:

Yek: Ew pêrkît wek “Bê, Bi, Ba” tê dîtin. Dîroka wê pêrkîtê vedigere serdemên gelên Ekadî, Ken'anî û Aramî, ew destnîşana wateya “mal, xanî” dikin, wek nimûne, navê gundê “Bablît” bi wateya “mala Bilît” tê... û hwd.

Didu: “Ba”, di Kurdî de bi wateya “li cem, li nik, li rex”, û bi wateya “ba” jî tê. Li gor vê rastiya taliyê, wek nimûne, navê Gu.Basûtê ji du kîtan pev dikeve: Ba û Sût, ango “bayê tûj û bi şewat”. Cihê Basûtê jî li ber derbendekê ye ku ji bakur de vekiriye, loma jî zora bayê Boraz/Bakur yê sar yekser lê dibe, ango ew nav li salixa cihê gund tê.

4. Navên ku bêjeya Qestel tê de hene: Hejmara wan pênc in. Bi giştî navên kesan û tiştine din li dû bêjeya Qestel tîn, wek “Qestela Elî Cindo, Qestela Kîşik... û hwd. Li derbarê navê Qestel jî, Yaqût El-Îemwî dibêje: Ew di zimanê Erebbî de bi wateya “Toza Vedibrose” tê. Bi zimanê şênîyê Şamê jî, ango bi Siryanî “cihê ku av jê peyda dibe” ye, bi zimanê şênîyê Meğribê jî “Palûta ku tê xwarin” e.

Ebdela El-Ĥilû jî dibêje: Ew bêje di riya zimanê Aramî re derbas zimanê Sûryanî bûye. Ew di Yûnanî û Latînî de “Kastellum” e, ango lûlikên ku av tê re tê birin e, /rûpel 448/. Ew bêje li ba Kurdan jî bi wateya dawîn tê bikaranîn.

5. Navên ku bêjeya “Til” li pêş tên: Piraniya wan ji binavkirina Kurda ne, wek: Til Êmo, Tilîlaq...

6. Navên ku bêjeya “Dêr” tê de heye: Hejmara wan şeş in. wek Êsen Dêra, Dûdêrê... Ew ji binavkirina Kurdan e, ji ber ku piraniya caran Kurd navên cihên şûnewarî bi “Xirabe, dêr, keloşk...” bi nav dikin. Gotina “dêr” bi xwe jî Suryanî ye, ji cihê ku nasikên ola Fileh tê de rûdiniştin re tê gotin.

7. Gundên bi “kefer” dest pê dibin: Ew heşt in, wek Kefersefrê, Keferdê.... Ew bêje nêzîk pergala binavkirina Siryanî ne. Di pirtûka /El- Usûl El- Suryanî.. rûpel 6/ de hatiye, ku ew bêje ji “gund, warên rûniştinê yên biçûk û wekî wan re” tê gotin. Ew di zimanê Siryanî de kokek e zimanî ye, bi wateya “veşartin û sergirtina” tiştan tê.

8. Gundên bi bêjeya “Birc” dest pê dibin yan jî “Birc” tê de heye: Hajmara wan pênc in. Birc bêjeyek e Yûnanî ye, ji “Burgus” hatiye, û paşê derbas zimanê Siryanî, Erebî û Kurdî bûye, ew ji bo mebesta nasandina Kelan û cihên berevaniyê û zêrevaniyê yên bilind bi kar hatiye.

9. Xerabe: Heft gund pê bi nav dibin, Xirabe jî wateya “avahiya kavilbûyî û kevin” dide.

10. Navên gundan û cihên şên di Kurmancî de navine mêza ne. Gava ku navê mêza yê yekeymar di rewşa bireseriyê de be, ew bi nîşandeka “ê” tê çivandin. Wek: Gundê Kîmarê, bajarokê Bilbilê...

Ev taybetiya rêzmanî jî ji zimanê gelê Xaltî yê kevnar de ma ye. Ew gel jî ji bapîrên gelê Kurd e⁽¹⁾.

II. Binavkirinên Osmanî:

Hin guhertin di binavkirina navên şênewaran de li serdema Osmanî li navça Çi.Kurmênc çê bûn, ew guhertin wiha bûne:

a- Tirkirina navan: Osmaniyan hin navên Kurdî yê gundan yekser guhertine û kirine Tirkî, wek nimûne: Navê Gu.Kurdo kirin “Hay Oğlo”... Hin nav jî wergerandin Tirkî wek: Gundê Mezin bûye “Biyûk Obe”, Gu.Sêwiya bûye “Oksûzli” û hwd. Hejmara wan navan deh û pênc in. Navê Çi.Kurmênc bi xwe jî hatiye wergerandin û bûye “Kurd Daği”.

b- Parkîten Tirkî: Ji bo ku navên Kurdî bi ser pergala zimanê Tirkî de werin, hin parkîten û bêjeyên Tirkî bi dawiya navên gundan ên resen xistine, ew bêje û parkîten jî ev in:

- **li:** Ji bo danasînê bikar tê, ew mîna zêder/veqetandekê ye di zimanê Kurdî de. Wek mînak, navê gundê Hopka bûye Hopkanli... û hwd.

- **Koy:** Bêjeke Tirkî ye, bi wateya “gund” tê. Mîna Gu.Qude, bûye “Qude Koy”.

- **Ûşağî:** Bi mebesta “zarok, law, nevî...” tê. Bi tevahî ew parkîten bi taliya navê damezrawê gund dikeve. Wek Gu.Naza bûye “Nazûşağî” ango “lawên Nazê”... û hwd.

- **Obe:** Wateya “kom, malbat...” dide. Wek gundê Dîkê, bûye “Dîkobesî”, ango “malbata Dîk”.

- **ler:** Ew nîşandeka gelemariyê ye di zimanê Tirkî de. Wek “Gundê Şêxan – Gundê Şêx” bûye Şêxler Obesî.

¹ - Parkîten “-hî” ji koka xwe de Horî ye. Parkîten “-pî” ji koka xwe de ji zimanê gelê Gotî ye. Parkîten “-enî” ji zimanê Xaltî – Orarto ye. Ew hemî millet jî ji bapîrên gelê Kurd in. /Dr.Xelîl Cindî, rûpel 9-10-24/.

III. Nav li dema intîdaba Firensî û piştî serbixwebûna Sûryayê:

Destlata Firensî li Sûrayayê şeweyê Osmanî di nivîsandina navên gundan de bi kar anî. Vê rewşê ta salên destpêkê ji serbixwebûna Sûryayê ajot.

Lê li dema avabûna yekitiya Misirê û Sûryayê, destlata yekîtiyê biryara Erebkirina navên “'Ecemî” li navça Çi.Kurmênc da. Li ber ronîya wê biryarê, karmendên dewletê: Nivîskarê sînor Îbrahîm Qadir û Miftiyê Efrînê Îbrahîm Ne'so, dest bi Erebkirina navan kirin, û gaveke rind tê de avêtin, lê dema ku yekîtiya Misirê û Sûryayê têk çû, pirojeya Erebkirina navan jî rawestî. Lê digel wê, hin nav li wê demê hatin guhertin, bûn Erebi û di belgeyên fermî de hatin bikaranîn. Wek nimûne: Navê Gu.Xalta bû “Xaldiyê”, Gu.'Umera bû “El-'Umeriyê” Tilîlaqê bû El-Sinoberiyê... û hwd.

Li sala 1976an, komîteke nû ji bo Erebkirina navan li Na.Efrînê hat binavkirin, ew komîte ji van kesan pêk hat: Îbrahîm Qadir ku hîn nivîskarê karûbarên Sînor bû li Efrîn, Corc 'Ebûd zanayekî zimanê Siryanî bû, û nûnerek ji ber birêvebirya karûbarên Şûnewariyê ve li Helebê. Wê komîtê karê xwe li ber ronîya van dazanînên fermî yên destlatê kir⁽¹⁾ û wiha xebitîn:

1- Navên ku ji koka xwe de Erebi, Siryanî, Romanî- Yûnanî bûn, û navên cihên şûnewarî wek xwe hiştin.

2- Hemî navên Kurdî û Tirkî kirin Erebi.

3- Eger gengaz tineba ku navek wergeriya Erebi, ew bi navekî Erebi diguhertin.

Piştî ku wê komîtê karê xwe bidawî kir, lîsteyên fermî yên navên Erebkirî bi biryara 580 li sala 1977an ji hêla şalyarê karê hundur de li Sûryayê mor bû û bi derket.

¹- Zanyarê Êhelebî Xêriddîn El-Esedî di pirtûka xwe “Ferhenga Êhelebê ya Raberdanî, perçe 4, rûpel 132 ” de, dibêje: Li hember Tirkirina navên Erebi ji hêla dewleta Tirkiyê de, destlata Sûryayê ji min xwast ku ez jî di karê Erebkirina navan de beşdar bibim, wê hîngê min lêborîn xwast û got: Ev lîstineke bi rastiyê, karê Tirkan nezanî ye, nezanî jî bi nezaniyê çareser nabe.

Li gor wê biryarê, 190 navên gundên Na.Efrînê hatin guhertin, û di kutik û belgeyên fermî yê tevahî û kesane de hatin bikaranîn, û li ser nîşanên çaterêyan jî hatin danîn.

Lê digel Erebkirinê û kiryarên dewletê yê din, şêniyê Çi.kurmênc navên gundên xwe yê ji bav û kalan û ji kûraniya dîrokê de mane bi kar tîne.

IV. Têbînên tevahî li ser navan li Navça Efrînê

Navên Xaknîgarî li navça Çi.Kurmênc parve du cureyan dibin: Navên dîmen û kendûkoran, û navên şengehan (bajar, gund, gundik, wargeh...). Em kanin van têbîn û kurtencaman ji wate û koka navên li navça Efrînê derfînin û li ber destê xwendevanên xwe dînin:

1. Li derbarê **Navên Xaknîgarî**: Piraniya pir, eger em nebêjin hemî navên kendûkor û dîmenên Xaknîgarî, wek navên çiyar, sirtan, geliyan, gir, girik, deşt, cowikên avê, navên zinar, dar, şikeft... û hwd, ango navên dîmenên sereke ji kendûkorên Na.Efrînê û pêkhatiyên wê yê xaknîgarî, ji aliyê bilêvkirin û wateyên xwe de Kurdî ne. Belkî hejmareke pir hindik jê, navine Îsalmî bin, ew jî kurdan ji bo pîrozgeh û cihên pîroz bi kar anîne. Û ji ber ku navên Xaknîgarî di belgeyên fermî de netên tomarkirin, ew nav nehatine guhertin û wek çawa ji sedsalan de bikar tên mane û têne xeftandin.
2. Li derbarê **Navên şenewaran**: Hejmara wan dora 360î ye. Ji me re diyar bû, ku binyata bêtirî %80 ji wan an Kurdî ne, yan jî ji binavkirina wan in. Ew binavkirin jî, yan navên kesane, yan navên hozane, yan jî ji salix û pergale dîmenên xaknîgarî yê cihên wan in. Hejmara din, ango %20 ji navan jî wiha parve dibin: 33 nav Siryanî ne, 18 Tirkî ne, dora 12an jî Erebi ne.
3. Navên Siryanî û Erebi li deverên Efrîna-Navend û Cindirêsê hene. Navên Tirkî jî li deverên Cindirêsê û Şera hene.
4. Nav li deverên Şiyê, Reco, Mabeta û Bilbilê hemahema bi tevahî Kurdî ne. Ew yek jî rastiya rewşa netewî ya Kurdî ya wan deveran ya pir sade diyar dike.

Helbestvanek:

Helbestvana Almanî Sara Kirch

Wergerandin ji Elmanî:

Tengezarê Marînî

Sarah Kirsch di 16.Nîsanê li sala 1935an li Limlingerode/Südharz ji dayik bûye û niha li Iyaleta Schleswig-Holstein dijî.

Piştî tewawkirina xwendina xwe, Sarah Kirsch di pir cihan de kar kiriye. Helbest, rêportaj, çîrokên zarokan, werger û kurteçîrok jî nivîsîne û dinivîse.



Sara Kirch

Suruşt û civak, têkiliyên hundirîn ên hûrhelbestane di deqên Sarah de rû didin.

Xwêner, zorê nakêşe ji bo ko ji helbesta Sarah têbigihê. Sarah bi xwe jî weha bîr û baweriya xwe li ser helbestê tîne zimên:

“Di destpêkê de nûser bo xwe dinivîse, û hebûn, diyarde û bûneweriyên xwe derdibire, bi şûn de kar li ser deqê xwe dike, dinijînîne, êdî dixê mîzên û şihîna hunerî û ciwanîyê û ji xwe dipirse: - Gelo ev helbest bo tekane ye, fer e, kesayetî ye? Eger nivîskar bibîne, ko ev helbest pîrvîtat e, jixwe cihê wê selika gilêşê ye, ji ber pêdiviya xwêner pê nîne û wî têkildar nake”

Bêguman, ev bîr û bawerî cihê guftûgo û gengeşê ne, lê ta çendî ev bîr helbest, dahênan û rola wergirtina deq û ciwanîya wî digunce, ev cihê behs û vekolanê ye.

Sarah li vir bi tenê ranaweste, her berdewam dike û dinivîse:

“Min çend parizdank bo xwe avakirine. Dema helbestekê dinivîsim, bi hûrbînî lê vedigerim. Ev tê wateya ko li ser deqê kar dikim.. lê ya rast û durust ew e, ko gereke çend hevalên

helbestvan hebin, ên di helbestê de têgehiştî bin û baweriya wî bi wan hebe”.

Sarah Kirsch 10 salan hevjiîna helbestvanê Elmanî Rainer Kirsch bû.

Di sala 1976an de, ligel hijmarek ji nivîskarên Elmana rojhilat a berê (DDR), beyanameyek imze kir. Tê de piştgiriya helbestvan û hunermendê Eelmana Rojhilat Wolf Biermann, dema ew ji hevweletiyê avêtibûn, hatibû kirin.

Sarah ne navê wê yê rast e, navê wê Ingrid Bernstein e, lê di bin navê sarah de, helbestên xwe dinivîsîn. Ji xwe ev rewşa pirtirîn nivîskarên, ko di welatên ne azad û ne demoqrat de dijîn e.

Berhemên wê:

Di navbera 1946-1994an de, panzde dîwanên wê hatine weşandin.

Xelatên ku wergirtine:

Di navbera salên 1973 – 1997an de neh xelat wergirtine.

Hin kêtehelbest ji helbestên wê:

1. Pîrr

Çî din hîn heye?
Du çav, belkî sê:
Cênîka wê li ser ya min,
ban ji serê mêvanxanan radikirin,
spîndar,
çilo, çiya
giya

2. Lehî

Neynika reş, doppel-zevî ciwaniya yarîkaxezan
Ewr silavê li hevcêwiyê xwe dike, asîman xelekek e
Êlek, du zerezengên her darekê.
Ez bedena te me, tu bi xwe re dikenî.

3. Cotyar

Cotariyek bi lingekî çerixkirî
Dabû nav firêza komirê, kumê xwe dihejand
Mîna ko bi kêf be;

4. Neynik

Neynika vala li mal.
Ne kesekî dêmekî ciwan.
Ewr xwe tînin nav de.
Ên milahîm, ên gewir, ên bêhesab birûsklêdan in.
Mîna ko ew di cengê de be.

5. Tenêtî

Pîrejinên li ber xaniyên sor
kêmguhpêdanên sor dar şikandibûn
Bi comerdî, çayê bo min anîbûn.
Lalîk vegerandibûn, kişandibûn
Guhêzgeh û çavdêrîgeh
Di pişta perdeyên xişrokî vala de.

6. Don Juan berî nîvro tê

Don Juan berî nîvro tê
Weha di telegrama xwe de tişt nivîsîbû
Hiştîbû biramim, min heyv hebû
Pîlan kiribû avweşînk niha
Pir dem nemabû ne carekê çav
Mezintir nîgar bikin lingan neşon
Rawestiyabûm li cihê ko wê dest pê kiribû bajar ew dîtîbû
Di qapûtê ber bi ba diket de li ser duçerxekî cirîdê
Destmala sipî ji ser milan pîrpirî
Jihevnezişkîbûna lêvan pekiya bû û çav
Xewir bûn min jê pirsî bû
Ji bo çi ew weha bi kêf e û bi şûn ve bawermend e
Hevdîtineke bi bedewiyê re
Ax çi dîtiye wî çerx berware(Xûz) danîbû

Li ber bayî kum rakiribû
Em herdû êxistibûn ser giya kartêl
Dest pê kiribû da hêja bibe balindeyekî ji laj(me'iden)
Kîşandibû li ser destpêkê bistirîne
Dema ko cur bi cur mijara Mozart pêxistibûn
Ez dizanim wî gotibû û
Hemî qawin
Sîstemên ekter Schönberg û
ez dê te aniha.. û ew dê baş bibe.

7. Şev tiliyên xwe dirêj dike

Şev tiliyên xwe dirêj dike
Ew min di mala min de dibîne
Di bin mêza min de rûdine
Zikxişkê dike, dê mezin bibe, xwe dipêçe
Û keldûman melevaniyê dike di boşahiyê de
Li xwe zêde dike, dibe dareke bedew
ya bi hêsanî dikarim bişikînim, ez yeke nû dikêşim, êdî
Dê hemî hezhevalên xwe, ên li ser tiliyan têne hijmartin,
ji hesab bavêjim.
Pirr tilî ne, ên min ko hene, kêman heval mane
Dirêj dike şev tiliyan
Dibîne, ew min di mala min de
Keldûman melevanî dikir, di cîgehê vala de
mezin dibû, dibû dara
miştbelg bi peyvan
Peyv nêzîkahî li zûhabûnê kiri bûn
Kelek melevanî di nav şivîlan de dikirin,
ên ez vê rojê nema hildikişim ser wan.

8. Gund.

Êvar bû, bêdengî gehîştibû gopîtkaxwe
Biraştokê kuhên xwe ker kiribûn,
Li ser kendal
Dara maziya li pêş asîmanê soravê
reş rawestiya bû.
Ez hatibûm gund,

ji coyê di nav zeviyên çirîskane de çûbû,
stêrk û kevir ronî didan
di malan de, ronahî gur dibû
toza dêrandî li kolanê
di bin lingan de,
mehfûrê havînrojê,
girêkan ji dergehê radigihîne yê din.

9. Min xwesti bû şahê xwe bikujim

Min xwestibû şahê xwe bikujim
û dîsan azad bibim.
Bazinê ko dabû min, ê navekî spehî
Li ser bû
min jêkir û peyv avêtibûn, ên min çêkiribûn
Bide berhev
ji bo çavên wî, deng, ziman..
Min şûşeyeke vexwarinê vala ava kiribû,
Dagirtibû, berpeqînan, ji bo ew herdem nêçîr bigirtaya. Da
dijdarî tamam bibûbaya
Min dergeh girtibû, çûbûm nav mirovan,
destbiratî li malê curecur girêdabû,
Belê azadî nexwestibû,
mezin bibûbaya
Ew heyok, giyan parçeyekî demoqrati ye,
ne tenê bêdeng mabû, nerimtir bibû
Dîlan gêrabû, dema min
serê xwe li dîwêr xistibû. Min nîq şopandibûn
Li xaka dijî wî peyivî bû, min sê bendên kêm di tewankê (Misenef) de,
komkiribûn.
Newekhevî, min derew jî
kiribûn.
Di dumahîka dawiyê de,
heme min xwestibû xiniziyê lê bikim.
Ez lê geriya bûm, bo pîlana xwe
bi dawî bînim,
min yekî din maçî kiribû,
daqena şahê min hew pêrgî wî hatibûya.

10. Zivistan

Ez xwedanasînê bi xwe re dikim, di vê demê de
xaniyê ko
bi kêmanî sê nifiş ji mirovan
dîtibûn, pencerên wan her vekirî bûn
li jor niçik”Xilozî”, dep zirav
hemen bo belgekarên di qazanan de çêbib
Dîwar
mîna daran giloveriya salê
Radihêjin çînên kaxezên dîwaran
li jêtirîn terzê xortaniyê, di navberê de
kelevajiyên nûçeyên rojnameyan
xwênerên matmayî bo hevalan
Du xêz Reichstag* sotayê pişt re
heyho hîn jî kaxezên dîwaran, pîşedest
sist bibû. An jî nêrîna banan ” hemen parçek asîman”
berî min jî di hizra wan de bû, bi guman
mîna befir û baranê, reşiya qîrê li hewşê,
dîwar ber bi sore ve biribû
hindeke din
gerek e bibînim, pişîkek
çend salan ligel min bû, çi
ji min dizane, ew hez ji parfûma min dike
an jî li vir baş rûnanim, lê
ez hînî sebrê bibûm, dema biçûk bûm li
nik rengê avê:
 mirov bendewar namîne, dîmen winda dike
û carna
dilê min xwe dilivîne di werîsên daleqandî de.
Wisa ye, dema devereke bêgane bibînim
Bo min li ser mêrxasan bipeyve an jî
Pirseke bike;
Ez hez ji kurkê xwe yê cotyariyê dikim, ji cezmên xwe
Û ji dêmên xwe yên xemgîn.

* Navê Perlemanî Almanî yê kevin e.

Helbest

PÊŞEWA PERWÎNAN

MERWAN BEREKAT

Demê ..
Dil ..
Can û xwe ve
Diyarî rojên te dikim
Ji bo ..
Gul û xunce vebin
Û ez ..
Wek pinpinîkeka wendayî
Yan jî ,
Bilbilekî
xew ji çavan revyayî
Yek rojê
Di gulistanên demên te de
Bijîm
Her renekî
Kesk bibînim
Û wêneyên nîgaşên xwe
Di tajanên bejna te de
rûnînim.
Dînokê eşqê me
Ji hestên xwe re
Te hest dibînim
Nameyên evîndariyê
Bi dengên çavên te
dixwînim

Bi hêzên ku ,
Di min de dileqin
Bîna şopa hatina te dikim
Ger pir
Yan jî , hindik
Bême veçengandin
Ji bilî..
Bîna berbanga te
Gula bîn ji gilîzê lêvên te
Û xwe di te û wan de
Tiştêkî nabînim
Ji ber..
Her û her
Bi şîleyê lêvên te sermest im.
Çîrokên wendayî
Helbestên jîndariyê
Rastiya hebûna xwe
Carna jî..
Xwe bi tev
Di çivên bejna te de
Dibînim.
Bayê fîncikên karxezalî
Wek piyalek
Ji meya tiriye Efrînê
Dil..

Hiş û her şanikeke min
Serxweş dike
Xwe di buhiştê jînê de
Dibînim
Te jî ..
Wek pêşewa perwînan
Dikim dîla zendên xwe
Û dîlana maçan
Li ser lêvan digerînim
Ez ..
Tu
Heyv û rojê
Bi tev dibin yek
Bi tîneka nû dijenin
Her ku ,
Em di kûraniya hev de
Wenda dibin
Pertew û tîrêjên
Ji esans û keçîniya eşqê
Di rehên me de
Jînê dirjînin
Ez ..
Tu û evînê
Wek bîn û gulê

Di hev de wenda dibin
Guleke nûrengî
Li cihê hevdîtînê
Diçînin
Bîna xudana
Memikên zîweleq
Di tac û pelên wê de
Berdidin
Piştî ku ,
Ez
Tu û axê
Di hev de wenda bibin
Ew gul
Dê bibe nîşana dêrîna eşqê
Piştî ku ,
Ez
Tu û bîrkerîna
Di hev de wenda bibin
Ew gul
Dêbimîne kevnedîroka
Evîndariyê
Û her bîna wê
Dê bimîne meya
Dilber û evîndaran

1 / 11 / 2009 z .

TENÊ TU XWEDA YÎ

Bahoz Duderî

Vê axê...
Ji me bêtir
Dilê xwe
Ji te re vekir
Lê dayê .
Vê axê ...
ji me bêtir
Kul û êşên te
Di xwe de veşartin
Hey lê dayê .
Te jî ..
Bi dil û canê xwe
Ev ax
Pîroz kir
Lê lê dayê .
Min bawer dikir
Ta dem biweste
Dîrok kal bibe
Û roj bimre
Tuyê bimînî
Hey lê dayê .
Ji bilî te
Kî kane xewnên min
bijmêre
Yan jî bi zimanê kutkuta
dilê min zanibe
Lê lê dayê .
Pêştî tu bû hevala axê
Omîdên çavan hatin birîn
Riya jiyanê
Li me bûye dijwar

Nema hêvî têne girêdan
Hey lê dayê .
Ta tu heyî lo dilo
Tu dê bikî qîr û hawar
Ne guhên min bîstin
Nejî çavên min dîtin
Çima ev agir ji min direve
Û mame sêwî
Li hember xwe
Lê dayê .
Ji îro û pêve
Nema ti çira
Mala me dikin ronî
Nejî ti tîn
Şevên me germ dikin
Lê lê dayê .
Tu li dûr yan nêzîk bî
Li jor yan li jortirîn bî
Min dibînî
Yan jî nabînî
Her ezê bimînim
Wek ax û rojê
Evîndarê destên te
Hey lê dayê .
Ta roja ez hebim
Ezê bimînim
Dîlê keseran
Keserên dîtina wêneyên
Dêmên te yên pîroz
Lê dayê .

Ararat

Rabe Ararat,
Qîza dest bi hine,
Bûka rû bi xêhlî,
Tu qe serê xwe yê bilind
Di nav berfa sipî de ranakî.
Ma qey tu nabînî!
Nalîna Sîpan û Axîna Bagokê,
Xuşîna Avaşîn nayê guhê te?!
Çiqas bi kul û bi derd in mîna min,
Pêl bi pêl diherikin,
Wek xwîna nav dilê min,
ku nexwaz û nebaş lê rûniştî ne,
Xwînxaran hawîrdorên te girtine,
Her zinarekî te tev kul û birîn e.



Mürüvet Y.Cacim

Rabe Ararat,
Tu çiqas bê xem î!
Va dixwazin dest bavên
Xêhliya te ya sipî!
Dilê min bû wek pêtên agir,
Jiyan li me kirin wek arê dojhê,
Gund şewitîn mal bûn wêran,
Ji bo ku nekin welatê me talan,
Rabe Ararat , rabe ji bo rûmeta însan.

Va ye dest da destê te Nûrheq,
Deng da dengê te Engîzek,
Dicle û Ferat,
Ji bo rûmeta xêhliya te diherikin Ararat,
Rabe serxwe rabe Ararat,
Birîna dilê min,
Hisreta bav û kalên min,
Can bi gorî Ararat.. rabe rabe!

Mürüvet Y.Cacim 21 /10 /1987

SIRÛDA STRANAN
A SILTAN SILÊMAN⁽¹⁾

Wergerandin:
SALIH BOZAN

PIRTÛKA YEKEMÎN⁽²⁾

Dilber:

Bira bi ramûsanên devê xwe min ramûse, çimkî evîna te ji meyê xweştir e.

Bihna bînên te xweş e, û navê te mîna bîneke weşiyayî ye, loma keçîndar ji te hez dikin.

Min li pê xwe kaşke, ji bo em birevin, Şah ez derbas nav nevînên xwe kirim, em bi te geş û şa dibin, ji meyê bêtir em pesna evîna te dikin, ên ji te hez dikin ew rastin.

Lê keçên Orşelîmê! Erê ez esmer im, lê ez gelek çeleng im, ez mîna konê Qeydar esmer im⁽³⁾, yan weke surdaqên Sulêmên.

Li min menêrin ku ez vîqas esmer im, va royê ez tarî kirime. Birayên min li min xeyidîn ez kirme rezvanê rezan, û min rezê xwe ne pa.

Hê.. yê ku dilê min jê hez dike, ji min re bêje tu li kû derê keriyê xwe diçêrînî? Li kû derê taştîyan mexel dikî? Çima ezê wek jineke rûbendî li kêleka keriyên hevalên te bigerim⁽⁴⁾?

Dilyar:

Lê çelenga jinan, ku tu nizanî bi şopa miyan de, karên xwe li hinda xaniyên şivanan biçêrîne.

Lê dilbera min! Ez te weke hespekê di erebanên Fêron de dişêbînim.

¹ - Silêman: Navekî Cûdî ye (Cihûyî ye) bi wateya “peyayê aştiyê” tê. Ew kurê Şah Dawûd e, û şahê Cûdanî yê tewrî navdar e û bi şarezahiyê tê naskirin.

² - Ew heşt pirtûk in, çar di vê hejmarê de, çar jî di hejmara bê de dê werin weşandin.

³ - Qeydar: Navekî Samî ye bi wateya “hêzdar yan reş”. Dibêjin ew kurê Ismayîlê Duyem e.

⁴ - Di wê çaxê de jinên tolaz rûyên xwe digirtin, û dilber jî ji bo kesek wê nasneke rûyê xwe digirt û bi çolan diket û li dilyarê xwe digeriya, loma jî şivanan dixast tevleşê bibin, ew jî ji vê rewşa xwe gazincan dike.

Çendîn gupên te xweşikîn di bin xarûzan de, çendîn qirika te çeleng e bi gerdenên zêrîn.

Emê guharên zêrîn ji te re çêkin, bi zîv bineqşînin.

Dilber:

Hîn şah li ser textê xwe ramediyayî bû, nardînê bîna xwe berda⁽¹⁾.

Dilyarê min ê min e, baxçeyeke tijî murre di navbera pêsîrên min de radikeve⁽²⁾.

Dilyarê min guşiyekî henê ye di rezê çavkaniya karê de ye⁽³⁾.

Dilyar:

Çiqas tu çelengî lê dilbera min! çiqas tu çelengî! Çavên te mîna du kewkiran in.

Dilber: Çiqas tu bedewî lo dilyarê min, bi rastî tu dilrevîn î! tu şîrin î û nevîna me ya teze yî.

Sapûtika mala me ji darên hevrestê ne û bi darên sewliyê niximandî ye.

PIRTÛKA DUYEMÎN

Dilber:

Ez nêrgiza Şaron im⁽⁴⁾, sosina newala me.

Dilyar:

Dilbera min di nav keçikan de weke sosineke di nav istiriyan de ye.

Dilber:

Dilyarê min di nav xortan de, mîna dareke sêvê di daristanê de, di bin siya wî de min dixwest ez rûnim, fêkiyên wî di qirika min de şîrin in.

Ez anîm eywangeha şahiya xwe, ala wî li ser min hezkirinbû.

Kulorên mewîjan bi min xwarin bidin, bi sêvê min vejîn bikin, çimkî ez bi evîne nexweşim.

Destê xwe yê çepê di bin serê min de bû, û yê rastê ez hembêz dikirim.

Hê keçên Orşelîmê..! Ez we sondkirin didim, bi xezalên çolan û bi evorên zeviyan, dilyarê min ji xew ramekin, hişyar mekin heta ew bi xwe radibe.

Ev dengê dilyarê mine têye, va di ser çiyar re têye, ser qûçan re xwe çedike.

¹ - Nardîn: Navê dareke bîn xweş e.

² - Lopikên sipîn e, ji dareke bi istirî û bîn xweş e, jê re digotin dara Murrê.

³ - Navê bajar û kaniyekê ye, li perava rojavayê Derya Mirî ye.

⁴ - Şaron: Bi zimanê Cûdî bi watya “deşt e” li berava bajarê Yafa ji başûr de dest pê dike û ta çiyayê Kermêl li bakur diçe.

Dilyarê min weke xezalê ye, yan jî mîna evorekî ciwan e, va ew e li paş dîwarê me sekiniye, di qulikan re dinihêre, çavên xwe li pencera ye.

Dilyarê min bi mi re got: Rabe dilbera min, çelenga min, were bi min re here.

.Seke zivistan êdina çû, baran rawestiya û vekşiya.

Zemîn gulgulî bû, wexta stranan hat, dengê kewkirkan ji zeviyên me têne.

Dara hêjîrê bi ber bû, rezên guldar bîna xwe berdane, de rabe dilbera min, de rabe were.

Dilyar:

Lê kewa min a xwe avêtî çirê zinaran, veşartgehên kendalan..! Rûyê xwe rabere min ke, dengê xwe bi mi gîhîne, çimkî dengê te şîrîn e, rûyê te bedew e.

Ji me re ew roviyên biçûk ên rezan telef dikin nêçîr bikin, rezên me êdina çîçek dane.

Dilber:

Dilyarê min ê min e, ez jî ya wî me, li nav sosinan keriyê xwe diçêrîne.

Vegere dilyarê min, ji bo ku ro bihna xwe bikşîne, û tarî bireve, mîna xezalan vegere, yan mîna evorekî ciwan yê çiyayên six.

PIRTÛKA SÊYEMÎN

Dilber:

Bi şevê pêde li ser nevîna xwe min destê xwe dipalikand, û bi dilsojî li yê ku dilê min jê hez dike digeriyam, û min ew ne dît.

Ezê niha rabim di bajêr de bigerim, di çarşî û mêdanan de, ezê li yê ku dilê min jê hez dike bigerim. Herweha ez çûm lê geriyam, û min ew ne dît.

Ez li pêwanên bajêr rast hatim, min ji wan pirs kir: “We yê ku dilê min jê hez dike ne dît”.

Gava min ew derbas kirin, min ê ku dilê min jê hez dike dît, ez raparikîm wî, û min ew berneda ta ku min ew kire xaniyê diya xwe; ew xaniyê ku diya min tê de bi min avis bû.

Hê keçên Orşelîmê..! Ez we sondkirin didim, bi xezalan, bi evoran, ji bo win dilyarê min ji xew ranekin, hişyar nekin heta bi xwe radibe.

Sirûda keçên Orşelîmê: Va kî ye ji çolistanê derdikeve, mîna stûneke dû, bi bîn û pixûr e, bi hemû merhem û kilên bazirgana ye?

Ew textê Silêmên e, li hawirdorê şêst pêlewan ji pêlewanên Izraîl in.

Gişkî bi şûran çekdar in, hokirî cenga ne, şûrên wan bi kêlekên wan de ji bo bêtarên êvarê ne.

Şah Silêman ji darên Libnanê textê kişweriyê çê kiriye.

Stûnên wî ji zîv çê kirine, balîf ji zêr, û doşeg ji erxewan û keçên Orşelîmê çarşeva wî ya hundirîn bi evînê çînik kirin.

Dilber:

Hê keçên Sehyon⁽¹⁾ derkevin û binihêrin şah Silêman bi zerzengê taçdar e; Bi zerzenga ku diya wî roja zavatiya wî ew pê taçdar kiriye, roja şahiya dilê wî.

PIRTÛKA ÇAREMÎN

Dilyar:

Çendîn tu ya çelengî dilbera min, çendîn tu çeleng î..! Çavên te di bin neftika te de mîna du kewkirkan in, porê te yê reş weke keriyekî bizinên ji pesara çiyayê Cel'ad dadikevin⁽²⁾.

Diranên te weke keriyekî miyên birî yên ji bin şuştinê derdikevin, her diranek bi tacêwiyê xwe re ye, yên kurmî di nav de tinene.

Lêvên te xêzeke qirmizî ye, gotinên devê te xweş in, her du gupên te di bin neftika te de du parçên henarekê ne.

Ustiyê te hemtayê birca Dawûd e⁽³⁾, yê ku ji çekan re ava kiriye, hezar mertal ji mertalên cengevanên stûr bidarde kirîne.

Pêsrên te du karên tacêwiyên xezala ne li nav sosinan diçêrine.

Hema ku roj bihna xwe belav dike, û tarî ji ber direve, ez dibezim hinda çiyayê murr û girê lûban⁽⁴⁾. Tu bi tevahî bedewî lê dilbera min, û ti kêmasî di te de tinene.

Ji Libnanê bi min re were lê bûka min, ji Libnanê bi min re were..! Binêre.. ji ser çiyayê Amane binêre⁽⁵⁾, ji ser pozê Şonîr û Hermon⁽⁶⁾, di gêdûka şêran de, ji çiyayên pilingan.. binêre.

¹ - Sehyon: Navê kelakê ye.

² - Cel'ad: Navê çiyakî li rojavayê Urdanê ye.

³ - Dawûd: Şahekî Îzraîlan î bi nav û deng e, bajarek bi navê wî hebû, û li ser sûra bajêr bircek hebû jê re digotin birca Dawûd.

⁴ - Çiyakî tijî dara Murrê bû, û girekî bi darên lûbanê niximandî bû, lûban jî dareke bîn xweş e.

⁵ - Amane: Navê çiyayê Libnanê yê biçûk e.

⁶ - Şonîr û Hermon: Navê du çiyayên niha jê re dibêjin Cebel El Şêx li başûrî Suryê ye.

Bi nêrînên çavên xwe, bi gerdenê di ustiyê xwe de te dilê min talan kir
lê xûşka min, lê bûka min..!

Çiqas evîna te şêrîn e lê xûşka min, lê bûka min..! Û evîna te ji meyê
noştir e, bihna bînên te ji bînan gişkan xewştir e.

Ji lêvên te hingiv dirjê, lê bûkê, di bin zimanê te de hingiv û mast e, ji
kerasên te bîna Libnanê tê.

Tu bihişteke girtî yî, lê xûşka min a bûk. Tu çaviyeke kilîtî, kaniyeke
dev siwaxkirî yî..!

Şitlên te firdewsa henaran e, bi fêkiyên hêjan e û bi hene û nardîn e.

Tu nardîn û zaferan î, qamîşê bîn xweş î, qurnefîl î, tu hemû darên
lûbanê û murrê yî. Tu bînên tewre baş î.

Tu kaniya bihiştan î, bîra bi ava zindî, tu cobarên ji Libnanê têne yî.

Dilber:

Hê bayê bakur hişyar be, û tu jî were bayê başûr, were bihišta min ji bo
bîna wê belav bibe, bila dilyarê min were bihišta xwe û ji fêkiyên wê
yên xweştir bixwe.

* * *

JÊDER

1. Pirtûka Pîroz: Çapemeniya Kambêrc – Ingiltera, bi zimanê Erebi, bê
diyarkirina dem û çapxanê.
2. Pirtûka Pîroz: Wergerandina şîrove, bi zimanê Erebi - Kahîre-Misir-1988.
3. Pirtûka Pîroz: Komeleyên Pirtûka Pîroz li Rojaveyê Nêzik, bi zimanê Erebi-
Bêrût- Libnan-1971.
4. Ferhenga Pirtûka Pîroz, bi zimanê Erebi. Bêrût-Libnan-1981.
5. Pirtûka Pîroz bi zimanê Rûsî, bê diyarkirina dem û çapxanê.

=====



Civak:

Bûyera Reş **((Ji bûyereke rast hatiye birin))**

Mihemed Qere Hesên

Xwediyê şagirtên Birovê (pola nehan) bê aram bûn, li ser agirê bendewariyê disotin, dengên zengilên mobaylan li ezmên li nav hev diketin. Bi wan dangan re razberîn jî gelekî gerim dibûn û tebatî ji canê xwediyên şagirtan direviya.

Endezyar (s) jî, piştî bihîst ku encamên ezmûnên şagirtan derketin, bi lez diçû dibistana ku kurê wî lê dixwend. Piştî westînekê, wî navê kurê xwe di lîsta serketinê de dît, ew biserketibû û pilene binld jî anîbûn.

Dê û bavê wî bi hêviyek mezin û coşeke bilind li paşeroja kurê xwe dinêrîn, wan hêvî dikir ku kurê wan Siwar siba bibe mirovekî hêja û payebilind, di dilên malbata wî de bihar û gulîstan dipişkivîn û şahiyê mezin jê re li darxistin. Endezyêr ji jina

xwe re digot: Perwerdekirina rast tê xuya kirin, cefayê me li arê ne çû. Wan paşerojê ronîdar di serê xwe de ji kurê xwe re hêvî dikir.

Dolaba jiyanê bi lez gerî û hat badan, wê bi xwe re pêdvî û daxwaz jî pir dikirin. Qasnaqa pêwendên civakê li serê Siwêr jî fireh dibû, wî heval û dostine nuh nas dikirin, temenê wî yê xortaniyê dest pê kir, ew ji hundir ve dihate guhartin, pir nazik û hestewer dibû. Eger temî û şîret lê dibûn, di xwe de diqirmizî û teng dibû û li serê xwe dinîşt. Hin rojan dereng dima û li dawiya şevê li mal vedigerî. Dê û bavê jê dipirsîn: Çima tu dereng mayî, tu li ku bû yî ? Wî bi zirtî digot: Ez li cem hevalên xwe bûm, min dixwend, mixabin xwediyên jî jê bawer dikir.

Siwar bi havalan re li serî û koşên kolanan radiwestî. Peyvên xirab jî dikirin, pir caran deng û kenên wan cîran jî hosan dikirin. Mîna nêçîrvanê ku çavên xwe li nêçîran bigerîne, weha çavên wan li balkon û penceran li keçikan digeriyan. Geh jî li gel xortan diçû nav gulîstanê, cixare vedixwerin, û mêrantiya xwe tê de didîtin!!

Rojekê hevalekî wî li qehwa entirnêtê jê re got: Min navnîşana malperek nuh aniye, ka em bi dizî têkevinê. Siwar jê dipirse: Ji bilî lîskê çi tê de heye? Hevêl got: Wêneyên keçên tazî tê de hene.

Ew axaftin bi dengnizmî di navbera wan de digerî. Li dawiyê dikevin wê malperê, û çûn û hatin wan li qehwê û ketina wê malperê pir dibe. Wan wêneyên keçên tazî ji hevalên xwe re jî rave dikirin û bi coş salix didan.

Di wê rewşê de, xwendina Siwêr jî gelekî bi paş diket.

Rojekê, Siwêr dengê fîtkirinekê dibihîse, ew bi lez dibeze ser balkonê, dinêre ku hevalê wî ye, wî dizanî heval

çi dixwaze. Ew dadikeve û hevalên din jî li serê kolan li benda wan bûn. Yekî ji wan ji Siwêr re got: Me bi hev re erê kiriye, ku em neçin dibistanê û herin nav bêxçe.

Li nav bêxçe gava her keçek an jinek bi tenê didîtin li pê dimeşin û şor davêtinê. Siwêr ji hevalên xwe re got: Serê min giran bûye û pir dêşe, ka em vegerin mal.

Yekî ji wan got: Xeman mexwe! Ezê serê te çê bikim; ji te re vê liba serêşê vexwe, nuha tuyê vehesî.

Piştî demek kurt, bi rastî jî êşa serê wî û xema dilê wî ji govdê wî bar kirin û canê wî pir sivik bû. Ji havalê xwe pirsî: Te çi lib da min, çiqas vehesîm û ketime xwaşiyek netê salixdan!

Hevêl got: Min liba xwaşiyê da te. Kînga te xwast ezê bidim te. Û herwiha bi borandina rojan re, Siwar û hevalên xwe bi vexwarina liban jî ketin.

Endezyêr didît ku rewşa kurê wî ne li ser hev e, lê nizanibû çi dibe, bi kurê xwe

re rûdinişt û şîret lê dikirin. Lê mixabin gotinên bavê Siwêr serê wî ne digirt, wî guhên xwe li ber dengê bavê xwe girtibûn û gotinên wî li ber bê diçûn.

Rojekê, hevalê Siwêr nasê liban hat girtin. Loma jî hevalên wî pir ditirsîn. Lê piştî demek kin ew hat berdan, hevalên wî lê kom bûn û jê re şeveke şahiyê li darxistin. Yê ku hatibû girtin ji wan re digot: Hevalno.. qet metirsin, girtin û zîndan karê mêran e, we dît ez hatim girtin û hatim berdam, çi bi serê min hat!?. Ez wek berê mam û hîn xortir bûm, bila ew min bigirin, mezinên wan jî dê min berdin. Mezinê wan bû dostê min. Piştî me rast bû, emê dîsa wek berê serbest wan liban bixwin û bifroşin jî, perên me jî dê pir bibin û emê ta mirinê serê xwe ji tikesî re danînin, heya ji dê û bavên xwe re jî!. Piştî re ew şefrê ji berîka xwe derdixê, zendê xwe birîn dike û xwînê di eniya hevalên xwe yek bi yek dide. Û dibêje: Ev xwîntêdana min pêwendiyêke ji biratiyê xortir di navbera me de çê dike, û di

navbera me de dibe dilsoziyêke ji dil de.

Dîsa rojekê, ew xortê ku hati bû girtin, bi fitkirinekê re guropa xortan kom dike û jê re dibêje: Îşev şevbêrka me li ba filanî ye, emê li wir kom bibin. Û ji wan re diyar dike, ku divê her yek çi bi xwe re wîne. Herwiha ew tişt li hev par ve dikirin û bi coşêke mezin berê xwe didin cihê soz. Ew xortê soz li ba wî bû, bi tena xwe bû, xudiyên wî xaneyek ji bo xwendinê jê re kirê kiri bûn, û pere jî jê kêm ne dikirin.

Li serê êvarê ew xortina, mîna çûkan çawa tev li ser hejekî⁽¹⁾ venin, weha li mala hevalê xwe kom dibûn. Wan sivreya xwe radixist, piyalên xwe tijî dikirin, lê ji bilî Siwêr, loma jî xortan henek pê dikirin. Hîngê Siwar dudilî dima, lê li dawiyê nîvpiyalek ji xwe re jî dikirê. Bi gulima yekemîn ji serê lêvan de ta hundirê zikê wî dişewitî, dixwast ji nuh ve velûke, lê hevalên wî qerez bi hev û pê dikirin, û digotin kî kane pêtir

¹- Hej: Pîkê darê hatî birîn, bi çilî ve ye û nehatî pejkirin .

vexwe, û weha şûşe bi ser xwe de hildidan.

Piştî ku meyê serê wan girt û sînoren serxweşbûnê derbas dikirin, ew ji malê bi der diketin bi kolanan diketin û bê hiş dimeşîn.

Roja din xortan ji hev dipirsîn: Te çawa pereyên wê şevê bi cî kirin û anîn. Siwêr bi dengêkî veziqitî, û şor bi zorê ji gewriya wî bi derdiket. Min bi alîkariya birayê xwe yê biçûk ji mal dizîn. Lê bavê min lê hay bû û li min xist, ez nizanîm çawa bikim! Hevalên wî jê re digotin, tu mezin bûyî, tu bûyî mêr, çê nabe bavê te li te bide, ev çî bav e!?. Divê tu xwe ji vî bavî xelas bikî.

Ev nêrîn dikeve bin kumê Siwêr û di mejiyê wî de rûdine, û ji hevalên xwe re erê dike, pîlana kuştina bavê Siwêr datînin. Yek ji wan şêşarekê jê re peyda dike û tîne, yek jî cilên xwepêçanê jê re tîne.

Û herwiha, li serê sibekê, piştî ku bavê Siwêr taştê dixwe, ji kebanîya xwe re dibêje, min îşev xewnek dît: Min dît em li gund in,

zemewendek dibe, zave jî ez im û dikevim serê dîlanê, min bi tijya dengê xwe stranek distira, lê ji nişka ve bazekî sipî tê dengê min ji gewriya min wek dezîkî dikşîne û direvîne. Kebaniya wî bi lez gotinê ji devê wî digre û dibêje : Xwedê xewna te xêr bike, çî xewneke ne baş e, bi xwedêkî bi serî meke.

Li wê hêvarê, Siwar wek balendeyê zo⁽¹⁾ rûyê xwe dipeça, şêşar dixist ber nava xwe û di tariya deriyê avahiyê de avsûn ji bavê xwe re digirt.

Wek her şev bavê Siwêr jî bi gewdeyekî westayî ji karê xwe vedigere. Gava dikeve dergeha avahiyê, dibîne ku çîre vemiriye, ew di şevreşiyê hildigere ser pêplûkan, wê hîngê pêjneke reş xwe davêje pêşîya wî. Berî ku bêje tu kî yî, Siwar şêşara devreş di serê bavê xwe de diteqîne, wî di xwînê de vedigevzîne û li şûna xwe dihêle û direve!!!

¹- Zo: Balendeyekî evsaniye li Mizopotemiyê nêrvîna adamizydiyê revandiye.

Civak:

Ensest

Mizgîn Bîngol

Piştî bihîstina zêdebûna zarokên li kolanan ên li Kurdistanê dijîn, ez careke din bi bûyerên ensestê (destdirêjiya nava malbatê) matmayî mame. Min dizanîbû ku di civakên girtî de destdirêjî, feydaya zayendî û her wiha tacîza cinsî jî heye, lê min nizanibû ensest li Kurdistanê ewqas zêde bûye.

Wê rojê hevalemî behsa bûyêrên ku ew bûye şahid kir, bi rastî hemû mûyên laşê min rabûn hewa. Çawa kesek dikare bi çavekî xirab li kesekî nava malbata xwe binêre. Ez bi xwe matmayî mame û bi rastî heger qasî ku tê gotin ewqas zêde be, mala me kurdan şewitiye.

Dema ku em hîna zarok bûn, dayikên me digotin xwe ji mêran biparêzin, gava ku hûn rastî dest dirêjiyê hatin, neçin ji kesekî derveyî malbatê re û mêrên nava malbatê re nebêjin. Heger hûn ji derve re

bibêjin dê leke were ser we, û heger hûn ji mêrên malbatê re bibêjin dê biçin ew zilamê ku destavêtiye we bikujin. Hîna di temenê zaroktiyê de dersa ku em çawa birînen xwe veşêrin nişanî me keçikan didan, lê tu carî ev şîret li zarokên kur(lawik) ne dikirin. Ez dizanim carekê keçek di nava eşîrê de hate kuştin, keçik hemile bû û dayika wê digot yê ku keça min hemil hiştîyê birayê min bi xwe ye. Beriya ku bavê wê bi hinceta paqîjiya namûsê bi benekî wê bifetisîne, keçikê ji dayika xwe re rastî gotibû. Hemû kesan digot dayika keçikê buxtanan li birayê xwe dike, lê kuştina wê keçikê weke trawmayekê ez bi salan tê de jiyam.

Di rojnameyan de, ez gelek caran nûçeyên civakî beriya yê siyasî dixwinîm, yê ensestê bi taybetî bala min dikişîne, herdem li wê keçika ku xalê wê destdirêj wê kir û

bavê wê jî kuşt difikirim, lê herdem weke bûyereke menfî min enestê dîtiye.

Li gelek welatan, weke welatên Latîn ên Emerika, welatên Erebb û her wiha Ewropayê me bihîstibû, lê li berfirehbûna enestê ya li Kurdistanê?

Gava mirov ji welatê xwe hez dike û weke min ji welat dût be, hemû jiyana welat weke bihuşt bi mirovan tê. Yiştên neyênî ji bîr dike, sebira xwe bi yê erênî tîne. Carna hezkirin mirovan kor dike, û bi rastî heger tiştêkî

ewqas wahşet bi awayekî berfireh li Kurdistanê heye, hezkirina welat bidin aliyekî, berpirsiyariya me hemûyan e ku em li ser vê mijarê rawestin, lê di hişyariya ku vê yekê jî ji milletên din re weke çandeke berovajî li kurdan bar nekin.

Di vî warî de ez li benda nêrînên xwendvanên ku li derbarê enestê çî difikirin, û kesên ku bûne şahîd an jî bi xwe rastî destdirêjîyê hatine me. Belkî, em bi vî awayî asta berfirehbûna vê birîna kûr bipîvin.

Ji malpera Azadiya Welat

18/10/2009

Kelepûr:

SEHÊN ZOZANAN

Qedrîcan

Nêçîrvanê Hawarê û çîroka sehê wî, Sehê Zozanan anî bîra min.

Çîroka sehên zozanan ne derew e û ne tiştêkî xeyalî ye. Min bi çavê xwe ne dîtiye, lê min bi guhê xwe bihîstiye. Yê ko ji min re gotiye ne merivekî tenê ye, dido ne.. yek jê, ji Zibdanê **Salih begê Remedan** e, yê din jî ji eşrafê Qundêrê **Dawid Efendî** ye..Min ji her diwan jî wisan bihîst:

Ji berê de, ji Kurdistanê pez tê Sûryê, Felestîn û carina diçe heta Misrê jî.. Pezên Kurdistanê li bazarên van welatan pir meqbûl e...Jê re pezê mor dibêjin.

Carekê, tacirekî, ji dora Erziromê pezê xwe aniye Sûryê û qederekî li Zibdanê maye. Zivistan pir sert hatiye, gelek berf bariyaye, nikarî bûye ji Zibdanê derkeve û pêşda here. Paşê mecbûr bûye, pezê xwe li Zibdanê firotiye mêvandarê xwe... Bi tacir re

sehekî zozanan jî hebûye ko bi rê da pezê wî ji guran diparast... Mêvandar, rû avêtiye ser wî û jê kûçikê wî xwestiye. Wî jî, ji ber heqê mêvaniyê fedî kiriye û sehê xwe ê qilçiq-şîn, bilind û sermezin, gurxenêq pêşkêşî mêvandarê xwe kiriye û vegeyriyaye welêt: Erziromê...

Wê çaxê li Zibdanê rêl û deviyên bi histirî tijî hebûne, ko wargehê gelek gur û hin tebayên din ên kûvî bûne û tucaran eman ne didan pezê wî welatî...Lê piştî ko sehê zozanên Kurdistanê li wir xuya dibe, gur û tebayên din newêrbûn nêzîkî pêz bibin, Sehê zozanan xwelî li serê wan dikir...

Piştî çend salan...Sehê zozanan, êdî pîr bû bû. Carekê, di nav wan deviyên de, gur lê dicivin û wî gelek perîşan dikan. Gava vedigere mal, xwedî wî dibîne ko laşê wî giş birîn bûye, û ji birînên wî xwîn

diherike. Xwedî pir li ber ketiye, birînên wî girêdaye...

Sibetir, seh wenda dibe, xwediyê wî pir lê digere, nabîne...dibêje qey ji ber birînên xwe li cîkî ketiye û miriye...

Qederê du mehan derbas dibe, xwediyê wî dibîne ko sehê wî jinişkave xuya bû. Lê ne bi tenê; pê re du sehên din hene ko ji wî bilintir û gir û ji wî hêj ciwantir in. Ew jî di rengê wî de bûne: Qilçiq-şîn!. Mêrik, pir kêfxweş dibe, heke baskên wî hebiwana ewê ji kêfa bifiriya...Ji mêvanê xwe re hema bi lez û bez berxekî serjê dike û li ber wan datîne...

Her sê kûçik wê şevê xwe rehet dikin. Sibehê, sehê pîr dikeve pêşiyê û her diwên ciwan didin dû wî.. Xwedî jî dizane ko hikmetek divê îşî de heye, ew jî pê wan dikeve...

Seh berê xwe dide nava deviyan.. wargehê guran. Cara pêşîn ew bi tenê diçe nav deviyan, her diwên ciwan xwe li paş vardiqilînin ..Vêcar gur dajon ser sehê pîr.. Hingî, her

diwên ciwan mîna birûskê xwe dirêjî ser guran dikin. Gur, çel-pênciyek hebûn. Şerekî mezin di nav wan de dibe.. Lê seh, nemaze her diwên ciwan zora wan dibin û guran yek bi yek dixenqînin...Û heyfa sehê pîr ji wan hiltînin...Paşê, vedigerin mala mêrik.. Xwîn bi ser çav û guhên wan ve diherike...Mêrik, dîsa ji wan re berxekî serjê dike û birînên wan derman dike. Lê mixabin, sibehê gava xwedî ji xew radibe û li dora xwe dinêre her sê seh jî xuya nakin.

Piştî çed salan, mêrikê Erziromî û mêrikê Zebdanî hevdu li Sûryê dibînin. Zebdanî çîroka sehê xwe, ji dostê xwe yê Erziromî re dibêje...Erziromî jî dibêje: Belê, xebera te ye.. Seh pîr bû bû, bi guran nikarî bû û birîndar bû bû...Rojekê min dî ji nişka ve xuya kir, piştî du-sê rojan ew û her du cewrên xwe wenda bûn û piştî mehekê dîsa her sê jî xuya bûn. Her du sehên ciwan cewrên wî bûn...Piştî du-sê mehan ew bi xwe mir, cewrên wî man..

-Jêder: Kovara **RONAHÎ**, sal 2, Hejmar 14, yekê Gulana 1943an, Rûpel 11.

• **Tirî tirş e**

Rovîk hebû pir geriya
Reng bûbû rengê miriya
Li ba dibû ji nêza ra
Tiştekek nedî bixwara
Ew roviya xemgîn bû
Xwarin bi wî şêrîn bû
Mêwek tirî li banî
Kete riya wê rovî
Ber dilê xwe av rijand
Xweda tirî jê re şand
Xwe avêtê bi ser neket
Dubare kir ber neket
Kir û nekir bi dest neket
Got: De lo ev tirî tirş e

• **Têderxistinok**

- 1- Yek bi yekê ne dudu ne
Ne mêt e ne jî jin e
Ne dirêj e ne jî kin e
Ne Çûçik e ne mezin e
Ne berx e ne bizin e
Awciy e bê tajî û bocî ye
Xeftan reş e kufte cî ye. Ew cî ye?
- 2- Çêla Hor silo, kete nav genmê kor Silo, çêlê parsî tune, gênim serî tune?
- 3- Ser kol e bin das e, bê def e bê kiras e, ne labût e ne misas e, ne sîr e ne pîvaz e, şilf tazî ye Xizmecî ye.
- 4- Dara li deştê, Sûsalk li piştê .

- 5- Ez çûm hind û hindistan min dît seyreka giran, keça pîr dayîka ciwan.
- 6- Dara rûtik, tijî mitik
- 7- Serî rût in tijî mit in .
- 8- Dara dumdumê, hezar li bine, tenê yek jê diçine. Ew çî ye ?
- 9- Pişt hesin e, dûv kevan e.
- 10- Du çire roniya(A), li ser du qul roviya(B), li ser aşekî digerya(C).
- 11- Kum ê sorik, tijî morik. Ew çî ye?
- 12- Ez ji bajarekî hatim kes lê tune (A), min du berx xwarin estî tê tune(B), li hespekî siwar bûm can tê tun (C).

Bersiv:

- 1- *Kêzika Reş.* 2-*Sipi.* 3- *Das.* 4- 5- *Pembo.* 6-*Kuncî .* 7-*Hejîr.*
- 8- *Dewat.* 9-*Dîk.*
- 10- *A:Çav. B:Poz. C:Dev û diran.*
- 11- *Hinar .*
- 12- *A:Zikê dayîkê. B:Memik. C-Dergûş.*

Weşanên nû:

Diyariyek nû ji pirtûkxana Kurdî re

Pirtûka ((*Ola Êzdiyan û Êzdiyetî li bakur rojavay Sûryê*)), pirtûkeke nû ye bi zimanê Erebi hatiye nivîsandin. Ew bi destûr û erêkirina wezaretê ragihandina Sûryê li dawiya sala 2008an de hatiye çapkirin.

Danerê pirtûkê Dr. Mihemed . E . Elî, di aliyê pirtûkxana Kurdî de li Sûriyê naskirî ye. Pirtûk ji / 154 / rûpelên ji pîvana / 24 – 17 /c.m pêk hatiye. Ev pirtûkek hêja ye û di naveroka xwe de zengîn e.

Gelek navnîşan di pirtûkê de hatine danîn û hûrik hûrik li ser wan hatiye rawestandin, emê di vê danasînê de hin navnîşanên sereke bidin xuyankirin wek :

- *Ola Êzdî li herêma Efrînê.*

-*Rehên dîrokî yên baweriyên Êzdîtiyê li Na.Efrînê.*

- *Erkên bawerî yên sereke di ola Êzdî de wek : Nimêj, rojî, hec û hemû cejnên êzdiyan.*

- *Zanyarên ola Êzdî li herêma Efrînê. Di bin vê navnîşanê de navên sê zanyarên olî hatine, ew jî ev in: Şêx Elî (1930 – 1994). Şêx Husên. Şêx Mihemed Kalo.*

Ji rûpela /76/an de pîrozgehên Êzdiyan li herêma Efrînê hene hatine jimartin, wek pîrozgehên: *Parse Xatûnê - Şêx Berkêt - Çêlxanê - Melek Adî - Şêx Rikêb - Şêx Qesab li Çiyayê Lêlûn* û hwd.

Ji rûpela / 91 / an de , mijara (*Dîroka Êzdiyan û Êzdiyatîyê li herîma Çiyayê Kurmênc*) hatiye danîn.

Li destpêka rûpe 117an jî, nivîskar li ser rewşa Êzdiyên Na.Efrînê li dema niha rawestîye. Li gor serhejmara texmînkî ya sala 1995an, hejmara Êzdiyan li Na. Efrînê û bajarê Helebê dora 10000 kes e.

Ji rûpela / 137 /an û ta ya / 150 /î, qewlên Êzdiyan bi zimanê Kurdî û tîpên latînî wek ji devê Şêx Husên derketine hatine nivîsandin.

Birastî, dema ku mirov bixweze ola Êzdî û rewşa wan li Na.Efrînê binase, divê li vê pirtûkê vegere û wê bixwîne. Bêguman ev pirtûk pirtûkxana Kurdî zengîn û dewlemend dike.

Em li dawiyê, mûmeka pîrozbahiyê ji danerê pirtûkê re diyarî dikim.

Merwan Berekat

Weşaneke nû...

Li destpêka payîzê, pirtûkeke Alfebeya Kurdî ye nû bi navnîşana ((Abeya Kurdî)) ronî dît. Pirtûk ji hêla momoste Merwan Berekat de hatiye amadekirin. Ew bi wêneyên rengîn û hevokên şêrîn hatiye xemlandin. M.Berekat her tîpekê rûpelek dayê, û herwiah hejmara rûpelên wê gihîştîye (47)an. Pirtûk bi erêkirin û rêdana şalyara ragihandinê ya Sûryayê hatiye çapkirin û belavkirin, ew li gelek pirtûkxaniyan tê firotin. Pirtûk ji fêrkirina zarokan û kesên ku nizanin tîpên Kurdî baş bilêv bikin re pir bi sûd e. Hêja ye em bêjin, ku çend pirtûkên wêjeyî û lêkolînî yên hêja yên M.Berekat bi zimanê Kurdî û Erebi li van salên dawîn hatine apkirin.

Birûskek

Perpîrsên Şevbêrkên Rewşenbîrî li Şamê... Hevalên hêja...

Bêguman, rêça ku we vebjartîye û ustubariyên ku we li ser xwe qebûl kirine, li hemî deman û ji hemî civakan re tiştêkî zor giring e, kesên ku pê radibin jî herdem cihê rêz û rûmeta bilind in. Lê sed mixabin, roja îro ew kar li welatê me bûye tiştê herî xizan, dijwar û belkî bê sûd jî. Lewr jî, kesên ku li vî welatî û di nava vê civakê de di warên çand û ramanê de dixebitin, lehengên rastînkî ne û cihê pîrozî û serbilindiyeke gewre ne.

Bi boneye heft saliya destpêkirina şevbêrkên rewşenbîriyê û berdewamiya wan bi şêweyekî birêkûpêk, desteya KOVARA PIRS, perpîrsên pêkanîna şevbêrkan û hemî kesên ku di ber de dixebitin û diwestin spas dike, karên wan pîroz dike, û berdewamî û serkeftinê ji wan re hêvî dike.

Spas

Desteya Kovara Pirs

30.7.2009

Navên Zarokan:

Nav kesan didin nasîn, lê pir caran nasnameya miletan jî didin zanîn. Ji ber wê jî, nav bûye perçak ji kelepûra miletan, pêwîste werin parastin û bikaranîn. Emê di her hejmareke Pirsê de, navine keçikan û hinine lawikan wînin, hêvîdr in ji hemiyar re bi sûd bin.

Navên lawan

Adar	Aram	Asû	Ado
Aran	Asgêr	Aferîn	Ararat
Asîd	Afran	Aras	Asîna
Afrîn	Arast	Astî	Aga
Arasta	Asûr	Agah	Arda(n)
Asvan	Agir	Ardelan	Ava
Agirî	Ardî	Avan	Agrîn
Arenan	Avdar	Ajar	Arêz
Avdel	Ajeng	Argistî	Avdî
Aiwan	Argon	Avesta	Akam
Arhat	Avî	Ako	Arî
Avsar	Akrê	Arîn	Avsîn
Akû	Arîs	Avtaw	Ala
Arivan	Avzêl	Alan	Armanc
Avzer	Alaz	Aro	Aware
Alîkar	Arsad	Awat	Amanc
Artûs	Awdel	Amed	Arûn
Awdil	Amêd	Arûng	Awedan
Amêdî	Arvan	Awir	Amêz
Asa	Axa	Amoigar	Asan
Axo	Amûd	Asin	Aza
Ando	Aso	Azad	Apê
Asos	Azî	Apo	Asteng
Azo	Ar	Astû	Azwer
Ara			

Navên keçan

dan	Aran	Astêr	Avtaw
Aferîn	Arda	Astêre	Avzen
Agrîn	Ardil	Astore	Avzêl
Aheng	Arê	Asûde	Awat
Ahîn	Arêz	Asûman	Awaz
Ahû	Arîman	Ase	Aweste
Aida	Arîn	Asîna	Awêne
Aiîn	Arîva	Asîne	Awêsir
Aina	Arien	Asîtî	Awêsta
Aiwan	Armîs	Askera	Awêta
Akam	Armûs	Asm	Awêza
Ala	Arûng	Asna	Awêzan
Alal	Arva	Asnaw	Awing
Alê	Arzû	Astî	Awira
Alik	Asan	Astîn	Awring
Alîn	Asê	Astûr	Awrîn
Alîsor	Aska	Atê	Axê
Almas	Aske	Avan	Axîn
Almast	Askewan	Avbîn	Aza
Alûs	Askê	Avê	Azade
Aman	Askol	Avîn	Azer
Amos	Aslîxan	Avnîn	Azîn
Anik	Asman	Avreng	Azîyan
Ano	Asrîn	Avrû	Azû
Ara	Astan	Avsîn	

Posta xwendevanan

Spas ji xwendevanên kovara Pirsê re, û ji her kesên ku berheman ji kovarê re bi rê dikin re. Bêguman komîta berpisiyar a kovarê li ser wan mijaran disekine .

☑ Spas ji **Bîrwerê Gênc**o re, wî çend helbestên xwe ji kovarê re bi rê kirine, yek ji wan helbestan di bin navnîşana (VELÎSTIN) de bû, ya din jî di bin navnîşana (DEZIYÊ NEWROZÊ) de bû, ew herdu helbest gihane destên me.

Di wan herdu helbestan de wêneyên helbestî yên xweşik hene , lê di aliyê vekît û rastnivîsê de lêveger bi wan divê.

Wek nimûne, emê ji her helbesteke Bîrwerê Gênc kîtekê di vê rûpelê de wek hatine nivîsandin dînin:

VELÎSTIN

Piştî ku ez mirim giyan fûriya
ezmên û di çivîkekê de
Cîwarbû .

Diya min :
Dike ku gornê têxe
Hembêza xwe ya cûmkirî
Û bihejîne
Bi fêrmisk û lehiyê nalînan
Bi gan ve wîne .

DEZIYÊ NEWROZÊ

Tu ne rojekê
Tê de pêlav bi destên vala
Kevalan li ser hevîrê heriyê
Nîgar dikin .

.....

☑ Spas ji **Mihemed Kero** re. Çîroka te gihaye destên me. Lê ew bê navnîşan bû, ev ji aliyekî ve, ji aliyê vekît , rastnivîs û rêzîmên ve jî, ew ne di asta weşanê de bû. Em pêşketinê ji te re dixwazin .

.....